# یادی ٧٠ ساڵەی شۆڕشی مەزنی سۆسیالیستی ئۆکتۆبر


P.O.BOX 7066
163 07 SPANGA
SWEDEN

Postgiro: 420 4506 - 2
ISSN 0284-3412

# سەردەمی نوێ

ڕۆژنامەیەکی سیاسی ـ فەرهەنگی کۆمەڵایەتییە

خاوەنی ئیمتیاز
د. جەمشید حەیدەری
سەرنووسەر
کریم حسامی

ساڵی دووهەم — ژمارە ٢٢ — خەزەڵوەر ـ نۆڤەمبەر ١٩٨٧ — نرخی ١٠ کرۆنە


## یادی ٧٠ ساڵەی شۆڕشی مەزنی سوسیالیستی ئۆکتۆبر

حەوتی مانگی نۆڤەمبەری ئەم ساڵ، گەلانی دیموکرات و پێشکەوتوخوازی جیهان، هاوکات لەگەڵ گەلانی سۆڤیەت، جێژنی ٧٠ ساڵەی سەرکەوتنی شۆڕشی مەزنی سوسیالیستی ئۆکتۆبر دەکەن ویادی ئەم ڕووداوە گرنگە مێژووییە شاهەنگ دەگێڕن.

ڕاستە شۆڕشی ئۆکتۆبر بە ڕێبەرایەتی لینینی مەزن و سەرکردایەتی حیزبی بۆلشەڤیك لە ڕووسیا سەرکەوت و سیستمی سیاسی و کۆمەلایەتی و ئابووری نیزامی قەیسەری لە ڕەگ و ڕیشەوە گۆڕی، بەلام کارتێکردنی ئەو تەنیا لە چوار چێوەی سنووری ئەم ولاتەدا تەنگە بەر نەبوو، بەڵکوو کاری کردە سەر ڕەوەندی پێگەیشتنی کۆمەڵی مرۆڤایەتی و چاوی گەلانی بن دەست و چەوساوەی کردەوە و ڕێگای خەباتی نیشاندا. هەر بۆیەش زەحمەتکێشانی ولاتانی جیهان شۆڕشی ئۆکتۆبر بە هی خۆیان دەزانن و هەر ساڵ یادی ئەم ڕووداوە گرنگە دەکەنەوە.

شۆڕشی سوسیالیستی ئۆکتۆبر، بۆ هەوەڵ جار لە مێژووی مرۆڤایەتیدا، بە پێچەوانەی هەموو شۆڕش وڕاپەڕینەکانی پێشوو، لەمەش بەکی گورەی زەوی شێوەی کۆنی بەرهەم هێنانی گۆڕی و چەوسانەوەی مرۆڤی بە دەستی مرۆڤ لە بەین برد. دنیای کۆن، دنیای پڕ لە چەوسانەوەی سەرمایەداری لەرزاند و سیستمی کۆلۆنیالیستی ئیمپریالیزمی تووشی قەیران و شپرزەیی کرد.

شۆڕشی سوسیالیستی ئۆکتۆبر دەسەلاتی تاقانە و موتلەقی ئیمپریالیستەکانی لە جیهاندا کۆتایی پێ هێناو زنجیری تێك سمراوی ولاتە ئیمپریالیستەکانی لێك پچراند و نەتەوەکانی کۆیلە و بن دەست کە بە زنجیری ئیستعمار بەند کرابوون، ڕێگای ڕزگاریان بۆ کرابەوە.

بۆ ل ٢٠

## یادی گۆران-ی مەزن هەر زیندووبێ



بیست و پێنج ساڵ لەمەو بەر ئەستێرەی ژیانی گۆران ی مەزن کوژا ـ یەوەو ماڵ ئاوایی لەگەلی کورد کرد، بزەی لێوی لە خوێنەران و گوێگرانی وون بوو. بەلام گۆران چۆن لە ژیاندا لە نێوماندا بوو ئێستاش دوای ٢٥ ساڵ هەروەك جاران کە باسی دێتەسەرشیعر و ئەدەبیات و هەلوێستی مرۆڤانەو خۆ ڕاگرتن لەبەر ئەشکەنجە و بەندیخانەو سەرشۆڕ نەکردن و کڕنوش نەبردنی بۆ دوژمن و پێ داگرتن لە سەر بیرو باوەر ناوی گۆران سەرناوە. دەمەتەقە لەسەر ڕۆلی گۆران لە پێش خستنی ئەدەب و شیعر، دەوڵەمەند کردنی فەرهەنگی زمانی کوردی، ڕێبەرایەتی قوتابخانەی شیعری نوێی کوردی بەردەوامە. بێگومان چەندی لەسەر نووسرابێ کەمە چونکە گۆران لوتکەیە لە شیعرو ئەدەب دا. پێویستی بە دەیان لێکۆلینەوە هەیە لەسەر هەر لایەنێکی بەرهەمەکانی: لە سەر زمان و فەرهەنگی شیعرەکانی لەسەر وەزنەی شیعری، لە سەر ئەو بابەتە نوێیانەی کە گۆران هێناویەتە نێو ئەدەب و شیعر (گەشت، گاڵتەو گەپ، ئۆپەرێت و هتد)، ڕیبازی شیعری گۆران، گۆران ی ڕەخنەگر، وەرگێڕ، ڕۆژنامەنووس، تێکۆشەری سیاسی ...

لە ئاست گۆران ی مرۆڤ و شاعیری بلیمەت کەمتەر خەمی کراوە، بەڵکو هێندێ جار نەیاران بە ئانقەست ویستویانە تارمایی بخەنە سەر ڕۆڵ و شوێنی گۆران لە مێژووی ئەدەبی کوردیدا. یا خود گۆران ی هونەرمەندی بلیمەت و ڕێبەری قوتابخانەی تازەی شیعری کورد ی لە گۆران ی تێکۆشەر و کۆمۆنیست جیا بکەنەوە بە بیانوی ئەوەی ڕێبازێکی سیاسی دیاری کراوی هەلبژاردوە. گۆیا تام و چێژ لە شیعرەکانیدا نەماوە، یا خود پلەی هونەری نزم تر بوە.

بۆ لاپەری ٧

## یادی قارەمانی شۆڕشگێڕ چێ گیڤارا

لە ڕۆژەکانی دە هەمی هەوەڵی مانگی ئۆکتۆبر، بە بۆنەی تێ پەر بوونی ٢٠ ساڵی بە سەر کوژرانی چەگیڤارا دا، رادیۆو ڕۆژنامە و تەلەڤیزیۆنی زۆربەی ولاتەکانی جیهان بەشێکی وتارو لاپەرە و بەرنامەی خۆیان بۆ یادی ئەم بە سەرهاتە تەرخان کرد. لە زۆربەی ولاتانی ئەمریکای لاتین بەم بۆنەوە مێتینگ و کۆبوونەوەی گەورە ساز کران و یادی ئەو قارەمانەی ڕێگای ئازادی یان زیندوو کردەوە.

لە تەلەڤیزیۆنی ولاتانی سوسیالیستی دا، بەرنامەی تایبەتی لە سەر ژیان و خەباتی چەگیڤارا بەڕێوە چوو. ئەرنستو چەگیڤارا کە یەکێك لە شۆڕشگێڕە هەلکەوتوەکانی ئەو سەردەمە بوو، ساڵی ١٩٢٢ لە ئارژانتین لە دایك بوو. کاتێك لە زانکۆی پزشکی لە بوینس ئایرس دەی خوێند،

بۆ ل ٢٠



هەواڵنامەی کتێب

پاشماوەی ل ١

## یادی ٧٠ ساڵەی ...

شۆڕشی سوسیالیستی ئۆکتۆبەر ڕێگای ڕزگاری و شێوەی خەباتی نوێی بە گەلانی بن دەست و بە کرێکارانی ولاتانی سەرمایەداری نیشان دا. حکومەتی کرێکاران و جوتیاران ،نەك هەر نەتەوەکانی ژێر دەستی قەیسەری ڕۆژهەلاتیش ڕاپەڕاند . تیشکی شۆڕشی ئۆکتۆبەر بوو بە ڕێگا ڕوونکەرەوەی گەلانی ڕۆژ هەلات بۆ ئازادی و سەربەستی . گەلانی ژێر دەستی حکومەتی ئیمپریالیستی ، **ڕووسیا** ئازاد کران و بە پێك هێنانی کۆمارەکانی سوسیالیستی ، ڕێگای بووژانەوە و پێ گەیشتنیان گرتە بەر . لە نێو خۆی ڕووسیادا بە قازانجی زەحمەتکێشان لە هەموو بارێکەوە ئالوو گۆڕی گرنگ پێك هاتن . هەر لە ڕۆژی هەوەلی سەرکەوتنی شۆڕشەوە ، حکومەتی کرێکاران و جوتیاران بە ڕێبەرایەتی لینینی مەزن فەرمانی ئاشتی داو گەلانی زەحمەتکێشی ڕووسیای لە شەری مالوێرانکەرانە ڕزگار کرد و ڕایگەیاند کە تەواوی پەیمانە ئیستعماریەکانی نابەرامبەری حکومەتی تەزار هەلدەوەشێنێتەوە .

شۆڕشی سوسیالیستی ئۆکتۆبەر ڕێگای خوێندن و پێگەیشتنی بۆ ڕۆلەی زەحمەتکێشان کردەوە. لە مانگی ئابی ١٩١٨ لینین فەرمانێکی ئیمزا کرد ، بە گوێرەی ئەو ڕۆلەی کرێکار و جوتیاران بە بێ دیپلۆمەش دەیانتوانی بچنە زانستگا و خوێندنی بەرز تەواو بکەن . شۆڕشی ئۆکتۆبەر بۆ هەوەلین جار لە مێژوودا ، ژنی لە کۆیلەتی و بن دەستی پیاو ئازاد کرد . مارکس و ئەنگلس کاتی خۆی لە "مانیفێستی حیزبی کۆمونیست" دا گوتبوویان " **کاتێك ژن بە تەواوی لە کۆیلەتی ڕزگار دەبێ کە خاوەن ملکایەتی فەردیە سەر ئامرازو کەرەسەی بەرهەم هێنان دا لە بەین بچێ و چەوسانەوەی مرۆڤ بە دەستی مرۆڤ کۆتایی پێ بێ** " . شۆڕشی سوسیالیستی ئۆکتۆبر بە کردەوە ئەم بۆچوونەی مارکس و ئەنگلس وەراست گێڕا و یەکسانی و بەرامبەری ژنی لە هەموو بەشەکانی سیاسی و کۆمەلایەتی و فەرهەنگی و کارو مزە و شوێنی کار لە گەل پیاو ڕاگەیاند و بە کردەوەش هێنایە دی . لینین دەیگوت :

**"تا ئەو کاتە کە پرولتاریا ، ئازادی تەواوی بۆ ژن دابین نەکردوە ،ناتوانێ خۆی بە تەواوی ئازاد بکا" .**

هەرچەندە شۆڕشی سوسیالیستی لە دواکەوتووترین ولاتی سەرمایەداری دا سەرکەوت و تووشی شەری نێو خۆیی و گەمارۆدانی چواردە دەولەتی سەرمایەداری هات و شەری دووەمی جیهانی بە سەردا سەپێنراو . میلیون کەسی لێ کوژرا و پتر لە هەزار شارو گوند و بنیاتی سەنعەتی لێ وێران کرا، بەلام دیسان ولاتی شووراکان بوو بە هێزێکی بە توانا و پر قودرەتی ئەوتۆ کە لە جیهانی ئێمڕودا هیچ مەسەلەیەکی گرنگ نیە کە بە بێ یەکێتی سۆڤیەتی چارە سەر بکرێ. نەك هەر ئەوە بەلکوو لە پێشکەوتن و پێگەیشتنی ڕەوەندی مێژوو لە جیهان دا ،نەخشی کاریگەر و لێ بڕاوی هەیە .

لە سەردەمی ئێستا دا، تەنیا مێشك ووشکەکانی سەر بە مەکتەبی کۆنە پەرستی و ئەوانەی پەردەی ئانتی کۆمونیستی بەری چاوی گرتوون ، ناتوانن تێ بگەن و ببینن کە سوسیالیزم بۆتە هێزێکی بە تەوژمی ئەو توکە وا لە بن پێلی گەورەترین ولاتی ئیمپریالیستی جیهان ڕەگی داکوتاوە و ئاراو قارای لە ئیمپریالیزم بڕیوە و لە ئەفریقای ڕەش ڕەنگ ئاژۆیی دەکا و لە ئاسیا پەرە دەستێنێ و ئەوین و لایەنگرانی زەحمەتکێشانی جیهان ، بە گەلی کوردیشەوە بۆ لای خۆ ڕادەکێشێ . کوردستانی ئێمەش بێگومان لە تیشکی پرشنگداری سوسیالیزم بەدوور نابێ گەلی کوردیش لە خەباتی سەخت و دژواری خۆی دا سەردەکەوێ و بەرەو سوسیالیزم ڕێگا دەبڕێ و درك و دالی سەر ئەو ڕێگایە پاك دەکاتەوە .

**بە هیوای ئەو ڕۆژە و بە هیوای سەرکەوتنی سوسیالیزم لە جیهاندا.** ●

## یادی قارەمانی شۆڕشگێڕ چێ گیڤارا



لەگەل ڕێکخراوە سیاسیەکانی چەپ پەیوەندی پەیدا کرد . بۆ ئەوەی ولاتەکانی ئەمریکای لاتین باش بناسێ و لە وەزعی ژیانی زەحمەتکێشان و وەزعی ئابووری و کۆمەلایەتی ئەم ولاتانە شارەزا بێ، دەستی کرد بە سەفەرو سورانەوە لە ولاتەکانی ئەمریکای لاتین. لەو سەفەرانەدا لەگەل کۆمەلانی خەلکی زەحمەتکێش پێوەندی دەگرت و زانیاریەکی زۆری وەسەر یەك دەنا .

لە گواتمالا لە گەل ئەو کوباییانە بوو بە ئاشنا کە دوورخرابوونەوەو جولانەوەی بیست و شەشی ژوئیەیان بناخە دارشتبوو . لەو سەفەرەدا ، چاوی بە فیدل کاسترو کەوت . هەر لەگەل هەوەلین دیداری دەگەل دەستەی ئەوان کەوت و بوو بە دوکتوری ئەو دەستەیە ، کە پاش چەندمانگ خۆیان گەیاندەوە ڕوخەکانی کوبا و لە " سیرامایسترا " شەری چەکدارانەیان دەست پێ کرد .

چێ گیڤارا لە پێشدا کرا بە فەرماندەی دەستەیەك و پاشان بوو بە فەرماندەی گشتی و لە گرتنی هاڤانا دا دەوری بەرچاوی یاری کرد . فیدل کاسترو لە بارەی چێ گیڤارا دا دەلێ : " یەکێك لە خاسیەتەکانی "چێ " ئەوە بوو کە بۆ بەشداری لە عەمەلیاتی مەترسیداردا داوتەلەب دەبوو"

ئەم خاسیەتەی لە لایەن هاوسەنگەرەکانیەوە ئافەرین و دەستخۆشانەی لێ دەکرا، بۆ ڕزگاری قوژبنێکی ئەم هەریمە گیانی خۆی فیدا دەکرد .

پاش سەرکەوتنی شۆڕشی کوبا، لە حکومەتی شۆڕشگێڕدا ، کارو باری سیاسەتی دەرەوەی بەڕێوە دەبرد و دابەش کردنی زەوی و زاریش لە ژێر چاوەدێری ئەودا لە کوبا بەڕێوە چو. سالی ١٩٦٥ چێ گیڤارا سەفەری بۆ ویتنام و کونگۆ کرد . سالی ١٩٦٧ چووە نێو جولانەوەی شۆڕشگێڕی بولیویا و لە ٨ ی مانگی ئوکتوبری ١٩٦٧ دا بە برینداری گیراو گوللە باران کرا.

سازمانی جاسوسی ئەمریکا دەمێك بوو جاسوس و بەکری گیراوی وەدوای چێ گیڤارا دا خستبوو، کە تووشی تەلەی بکەن بیکوژن . بەکری گیراوانی ئەمپریالیزم لەو نەخشە گلاو و چەپەلەدا سەرکەوتن ، ئەو قارەمانە شۆڕشگێڕەیان کوشت، بەلام خەباتی چێ گیڤارا ، بیرو باوەری ئەو ڕەمزی شۆرگێری فیداکاری ئەو،هەر ماوەو بەردەوامە و نەك هەر خەلکی ولاتانی ئەمریکای لاتین بەلکو خەباتگێڕانی ڕێگای ئازادی و سوسیالیزم لە سەرانسەری جیهان ئیلهامی لی وەردەگرن.

بیرەوەریەکانی چێ گیڤارا بە زۆربەی زمانەکانی جیهان ،لەوانە بە زمانی کوردیش بلاو بۆتەوە و بۆتە ڕێنوێنی شۆڕشگێڕانی ڕێگای ئازادی و سەربەستی و دیموکراسی ..." . ●

تێزی پێنجەم: مارکسیزم و پرۆدیۆنیزم لە مەسەلەی نەتەوایەتی دا

# بە پێشوازی حەفتا ساڵەی شۆرشی مەزنی سۆسیالیستی ئۆکتۆبر

مارکس بە پێچەوانەی دیموکراتەکانی وردە بورژوا، گشت ویستە دیموکراتیەکانی بە بێ هەلاواردن بە موتلەق نەدەزانی، بەڵکو دیاردەی مێژوویی خەباتی کۆمەلانی خەلکی دژی دەرەبەگایەتی لە ژێر رێبەرایەتی بورژوازی دا تەماشا دەکرد. لەو ویستانە تەنانەت یەکیش نیە کە لە هەل و مەرجێکی دیاریکراو دا نەبێتە هۆی فریو دانی کریکاران لە لایەن بورژوازیەوە و لەو رێگایەدا کەلکی لی وەرنەگرن. لەم بوارەدا هەلبژاردنی یەکێک لە داخوازیە دیموکراتیە سیاسیەکان، واتا دیاری کردنی چارە نووسی نەتەوەکان بە دەستی خۆیان و دانانی ئەو لە بەرامبەر ویستەکانی دیکەدا، لە باری تیئوریەوە لە رەگ و ریشەوە ناراست و هەلەیە. پرولتاریا کاتێک دەتوانی سەربەخۆیی خۆی بپارێزی کە لەگەل خەبات بۆ بەجی گەیاندنی هەموو ویستە دیموکراتیەکان بە بێ جیاکردنەوەی ویستی جەمهوری، بۆ رووخاندنی بورژوازی خەباتی شۆرشگێری درێژە پێ بدا.

لە لایەکی دیکەوە مارکس بە پێچەوانەی پرودیونیستەکان کە لەبەر "شۆرشی کۆمەلایەتی" مەسەلەی نەتەوایەتیان وەلا دەنا، بە لەبەر چاو گرتنی بەرژەوەندی خەباتی چینایەتی پرولتاریا لە ولاتانی پێش کەوتوودا، ئەسلی بنچینەیی ئینترناسیونالیزم و سوسیالیزمی لە پلەی هەوەلی گرینگی دادەناو دەیگوت: "میلەتێکی زولم لە میلەتێکی دیکە بکا، ناتوانی ئازاد بێ". مارکس لە روانگەی بەرژەوەندی جولانەوەی شۆرشگێری کریکارانی ئالمانەوە، سالی ١٨٤٨ داوای کرد کە دیموکراسی سەرکەوتوی ئالمان ئازادی نەتەوەکانی ژێر ستەمی ئالمان رابگەیێنی و بە کردەوەش ئەنجامی بدا مارکس لە روانگەی خەباتی شۆرشگێری کریکارانی ئینگلیسەوە، سالی ١٨٦٩ داوای جیابوونەوەی ئیرلەندی کرد لە ئینگلستان و ئەوەشی لی زیاد کرد "لانی کەم دوای جیابوونەوە کاربگاتە فیدراسیون".

مارکس تەنیا بە هێنانە گوری ئەم داخوازە لە راستیدا کریکارانی ئینگلیزی لە گیانی ئینترناسیونالیستی پەروەردە دەکرد. تەنیا بەم چەشنە دەیتوانی ریگا چارەی شۆرشگێری ئەو مەسەلە مێژوویی بە بخاتە بەر دەمی هەل پەرستەکان و ریفورمیزمی بورژوازی کە تا ئێستا پاش نیو سەدە لە ئیرلەند ریفورمیشیان نەکردوە. مارکس تەنیا بەم چەشنە دەیتوانی لە بەرانبەر مەراییکەرانی سەرمایەدا کە لەبارەی خەیالی بوون و ناکردەوەیی ئازادی جیابوونەوەی نەتەوەکانی بچوک و لەبارەی لێک کۆکردنەوەی ئابوری و سیاسی هەرایان ساز کردبوو، دیفاع بکا. مارکس لەم لێک کۆکردنەوەیە، بەلام نەک بە شێوەی ئیمپریالیستی، لە نیزیکی نەتەوەکان، بەلام نەک لەسەر بناخەی توپزی و مل هوری، بەلکو لەسەر بناخەی یەک گرتنی ئازادی کریکارانی هەموو ولاتان دیفاعی دەکرد.

مارکس تەنیا بەم چەشنە دەیتوانی لە مەیدانی چارەسەرکردنی مەسەلەی نەتەوایەتیدا، هەنگاوی شورشگێرانەی کۆمەلانی خەلک بخاتە بەرامبەر دان پیدانانی روالەتی و مەراییکەرانە، سەبارەت بە یەکسانی ماف و مافی نەتەوەکان لە دیاری کردنی چارە نووسی خۆیاندا. شەری ئیمپریالیستی لە سالەکانی ١٩١٤ ـ ١٩١٦، هەر وەها مەرایی و دووروویی هەلپەرستەکان و کائوتیسکیەکان، راستی سیاسەتی مارکسی نیشان دا کە پێویستە بۆ گشت ولاتانی پێشکەوتوو سەرمەشق و نموونە بێ. چونکە ئێستا هەر یەک لەوان زولم لە نەتەوەیەکی دیکە دەکا.

تێزی شەشەم

**سی جورە ولات لە بۆ چوون لەگەل مافی نەتەوەکان لە دیاری کردنی چارەنووسی خۆدا.**

لەو بارەوە پێویستە سی جور لە ولاتە گەورەکان لێک جیا بکرینەوە:

١ـ ولاتە پێشکەوتوەکانی سەرمایەداری ئورووپای رۆژ ئاواو ولاتە یەکگرتوەکانی ئەمریکا. لیرەدا ماوەیەکە جولانەوەکانی نەتەوەیی پێشکەوتنخوازی بورژوازی کوتاییان پێ هاتوە. هەر یەک لەو نەتەوە "**گەورانە**" لە نیو خوی ولات و لە موستەعمەرەکانیش زولم لە نەتەوەکانی دیکە دەکەن. ئەرکی پرولتاریای نەتەوەی زال لیرەدا راست هەر ئەو ئەرکەیە کە پرولتاریای ئینگلیس لە سەدەی نوزدەدا لە ئاست ئیرلەند بوویەتی. بورژوازی لە هێندی ولاتی بچوک کە لە سالەکانی ١٩١٤ ـ ١٩١٦ تێکلاوی شەر نەبون وەک هولەندو سویس، لە دروشمی "مافی نەتەوەکان لە دیاری کردنی چارەنووسی خۆدا" بۆ پێنە کردنی بەشداری لە شەری ئیمپریالیستی بە شێل گیری کەلکی وەردەگرت. ئەوە یەکێک لەو بیانویانەیە کە سوسیال دیموکراسی ئەم ولاتانە پال پیوەدەنی کە لە مافی نەتەوەکان بۆ دیاری کردنی چارەنووسی خۆیان حاشا بکا. لە سیاسەتی راستی پرولتری، بەبەلگەی ناراست تەنیا لە وەلاتانی "بەرگری نیشتمان" لە شەری ئیمپریالیستی دا دیفاع دەکا.

٢ـ **رۆژهەلاتی ئورووپا**: ئوتریش، بالکان و بەتایبەت رووسیە. هەروەها لیرەش سەدەی بیستەم جولانەوەکانی میللی بورژوا ـ دیموکراتی پەرە پیداو خەباتی نەتەوایەتی توندوتیژتر کرد. پرولتاریای ئەم ولاتانە هەم بۆ بەجی گەیاندنی وەرگیرانی جولانەوەی بورژوادیموکراتی و هەم کاروباری یارمەتی بە شۆرشی سوسیالیستی ولاتانی دیکەدا بە بی دیفاع لە مافی نەتەوەکان لە دیاری کردنی چارەنووسی خۆدا ناتوانی ئەرکی خۆی بەجی بگەیەنی لیرەدا بە تایبەت مەسەلەی تیکەل کردنی خەباتی چینایەتی کریکارانی نەتەوەی زۆر لی کراو لەگەل کریکارانی نەتەوەی زوردار دیژوار و بە تایبەت گرینگە

٣ـ ولاتە نیوە موستەعمەرەکانی وەک چین و ئیران و تورکیا و گشت کولونیەکان کە بە تیکرایی میلیاردیک خەلکیان هەیە. لە هێندی لەم ولاتانەدا جولاوەی بورژوادیموکراتی تازە دەست پێ کراوە، لە هێندیکی دیکەدا هێشتا زوری ماوە دەست پی بکری. سوسیالیستەکان پێویستە نەک هەر ئازادی بە بی قەیدو شەرت و بە بی کرینەوەی موستەعمەرەکان بخوازن (ئەم خواستەش لە باری سیاسیەوە بێجگە لە دانپان بە مافی نەتەوەکان لە دیاری کردنی چارەنووس دا شتیکی دیکە نیە) بەلکو دەبی بە شیوەی هەرە لی براو لە هیزەکانی هەرە شورشگیرو جولانەوەی بورژوادیموکراتی و رزگاریخوازی نیشتمانی ئەم ولاتانە پشتیوانی بکەن پێویستە یارمەتی بە شەری شورشگیری ئەوان دژی دەولەتی ئیمپریالیستی زوردار بکەن و لە راسەریشی ئەوان دیفاع بکەن.

**پاشماوەی ئەم تێزانە لە ژمارەکانی داهاتوو دا دەخوینینەوە.**

پاشماوەی لاپەرەی ٤

# کورد و ...

هەل و مەرجی وا پێک ناهێنی بۆ چارەسەر کردنی مەسەلەی کورد لە داوارۆژیکی نیزیکدا. بیگومان هاتنە سەر حوکمی ج ریژیمیک لەو ولاتانە دا بی جیاوازی نیە بۆ چارە سەر کردنی مەسەلەی کورد. واتە ئەو گورینانەی لە هەر کام لەو ولاتانەدا پێک بێ تەئسیر دەکاتە سەر دوا رۆژی مەسەلەی کورد. جا ئەو گورینانە گەر بەرەو دیموکراتی کردنی ژیانی کۆمەلایەتی بێ، ئەوە بزووتنەوەی کوردیش پشوودەدا و بە هیز تر دەبێ، بە پێچەوانە ئەگەر وانەبی دەبێتە هوی لیدان و دامرکاندنی. وەک کودیتای مایسی سالی ١٩٦٠ لە تورکیا، ری خوشکەر بوو بۆ سەر هەلدانیکی نوی لە بزووتنەوەی کوردی دا.

بۆ ل٨٠

هەواڵنامەی کتێب



## شینی گۆران

هەر لەبۆتانەوە هەتا سۆران
هەموو سۆرانی‌شینە بۆ گۆران
هەر لە کوێستانەوە هەتا گەرمێن
پەخەمان دادڕاوە تا دامێن
لە جزیرە هەتاکوو بەحری ڕەش
بە کزێ سەری نەنایێ‌لە هەش
لە دیار بەکرەوە هەتا ورمێ
سەر بەقوڕ، مل بەکوێنە نێر و مێ
هەر لەکەرکووکەوە هەتاکوو سنە
شین و ڕۆڕۆ و فغانی پیاو و ژنە
لە مەریوانەوە هەتا زێبار
وەك زرێبارە چاوی کوردی هەژار
هەر لەزاخۆ هەتاکوو کرماشان
پرسەیە، ماتەمە، بەخۆدادان
لەمەهاباد هەتا سلێمانێ
ناڵە ناڵە لەباتی گۆرانی
هەر لەپێنجارەوە هەتا شەمزین
کچ و کوڕ، لاو و پیری کورد شەمزین
لە شنۆوە هەتاکوو سنجابی
تووشی کوردێکی بێ‌کەسەر نابێ
هەر لەهەولێرەوە هەتا باوە
نەتەوەی کورد بەشێوە، تاساوە
جا چلۆن دڵ بەخەم نەبێن، نەگرین
جا چلۆن کۆری شینی بۆ نەگرین
شاعیرێك بوو بەنرخ و بێ‌وێنە
بیری ڕۆشن بوو، چەشنی ئاوێنە
شاعیرێك بوو بەجەرگ و هەڵکەوتوو
پێشڕەوی گەل بوو نەك لەگەل کەوتوو
تاکی کەم بوو لە جوان پەرستی‌دا
وەکوو مێو بوو وشە لە دەستی‌دا
هەستی پاك، مێشکی تازە، بیری نوێ
شیعری پڕسۆز، قسەی بەتام و خوێ
دڵتەڕ و خۆش‌خەیاڵ و ناسك‌بین
بەهونەر، شارەزا، وشە‌ڕەنگین
پێم بەری شیعر و مۆسیقا تۆران
بۆیە بردیانەوە سەرێ گۆران
یا خودای جوانی تووڕە بوو لێمان
ئەوجرایەی ڕەوا نەدی پێمان
ڕۆژگار گەوهەری وەبن گڵ دا
داخی ئەومایەوە لەناو دڵدا
داخەکەم ئەوبڵێسە دامرکا
کە خەریك بوو وڵاتی ڕووتر کا



ڕۆیی گۆرانی خۆشەویست ڕۆیی
شین و ڕۆڕۆی گەلی نەبیست ڕۆیی
ڕۆیی بێ‌ئەوەی گەلی بگا بەمراد
ڕۆیی بێ‌ئەوەی ببێ کورد ئازاد
ڕۆیی ئاواتی بردە بن گڵی ڕەش
ڕۆیی کورد ماوە بێ‌کەس و بێ‌بەش
حاجی، گۆران و پیرەمێرد مردن
داخەکەم کوردی ئێمە هەر کوردن
کوردن و تووشی ڕۆژی تەنگانەن
مەردن و دیلی دەستی بێگانەن

مەهاباد - ١٩٦٢

## بۆ عەبدولا گۆران

شیعری: عبدالوهاب البیاتی
دیوانی بەیاتی/ ل - ٦٦١ -
لەتیف هەڵەت: -
کردوویەتی بەکوردی

بەفر لە کێوەکانی کوردستاندا
دەتوێتەوە
بەهاریش لە دۆڵەکاندایە
وشەش خوێی نانی ئەوین و گۆرانی‌یە
هەزار پردی لە نێوان مەرگە و فەرامۆشی‌دا
لێ دروست دەکات..
لە وشەکانی‌دا مێرگە دەڕوێ
گزنگی پاڵە هونەرمەندەکە
سەگسارەکان رادەماڵێ‌و
نەتەوەیەك لە دایك دەبێ
مرۆڤ لە دایك دەبێ
دەسا ئەی بووکی شیعرو ئەی سەروای خەم
هەڵگرێ بە لووتکەداو
دەریاو سەردەمەکان پەی‌کەو
بەو گزنگەدا بگە کە لە کێوەکانی کوردستاندا
هەڵدێ..
ئەلەوێ لە لووتکەدا
کە هەمووی بەفرو ئاگرە..
ئەلەوێ - گۆران - ی شاعیرمان
شینگی خۆی بۆ خۆرو هەڵۆ هەڵمالیوە..
لە پێناوی ئەوەدا
نەتەوەیەك لە دایك بێ‌و
مرۆڤێك بێتە کایە..!

## بۆ مامۆستا کۆچ کردوم .... گۆران

هاوار

بەراستی یادی ئەو یەکدوساڵەی دوایی ژیانی کە نۆرەی پێکەوە بوین لە بەغداد قەت لە دڵ دەرناچێ - وا بۆ یادی کۆچکردنی ئەو شاعیرە مەزنە ئەم هەڵبەستە پێشکەش دەکەم.

هەواڵێکی پەست وناخۆش، کۆستێکی تازەی جەرگ بڕ
خوێنی ناو دەماری مەیان، لەشی وشک کردم لە پڕ

پاشماوەی لاپەرەی ١

# یادی گۆران-ی . . .

بێ لێکدانەوەی ئەوەی کە تایبەتیەتی شیعری سیاسی جیاوازە لە لیریك ،ئەمە لە لایەك ، لە لایەکی تریش مترپە. کردنی بیری نیشتمانی و نەتەوەیی بە بیری مارکسی ناوەرۆکی کۆمەلایەتی شیعرەکانی گۆران ـی قوڵ تر کردوە و لایەنگری چینی چەوساوەی لە شیعرەکانی دا بە هێزتر کردوە.

مێژوی ئەدەبی کوردی لە سەرەتایەوە تا ئەمرۆ ناوی زۆر کەڵە شاعیری بە پیتی زێرین لە لاپەرەکانی دا تۆمار کردوە. کە هەر یەکەیان لە قۆناغی مێژوی سەردەمی خۆیدا کۆڵەکەی پتەوی ئەدەبی کوردی چەسپاندوەو دەربڕی بیری کۆمەلایەتی و رادەی هونەری قوناغی مێژویی بوو. لە سەدەکانی (١٤ ـ ١٨) دا لە نێو سەدان شاعیر ، ناوی چەند شاعیرێك زۆرلیان لە پێش خستنی ئەدەبی کوردی دا هەر دەم ـ دوویات دەکرێتەوە . وەك : فەقێ تەیران و جەزیری ، جەزیری و خانی ، خانای قوبادو ... هتد . لە نێو ئەو چەند ناوانەش دا خانی شوێنی تایبەتی هەیە ، چونکە مەسەلەی نەتەوایەتی و رزگاری کوردی هێناوەتە نێو ئەدەب ، بەمەش داهێنەکی نوێی لە مێژوی ئەدەبی کوردی دا تۆمار کردوە. " مەم و زین " ی خانی بەشاکاری ئەدەبی رۆژهەلات و جیهان دەژمێردرێ. سەدەی نۆزدە سەرەتای قوتابخانەیەکی نوێ لە شیعرو ئەدەبیاتی کوردی داتۆمار دەکا لە سەر دەستی مەلا خدری نالی .هەر لەو سەدەیەش دا چەند کەڵە شاعیری تر دەورێکی دیاریان هەیە وەك: مەولەوی ، کوردی ، سالم و شێخ رەزای تالەبانی و حاجی قادری کۆیی . لە نێو ئەوانەشدا حاجی قادری کۆیی بە خاوەن قوتابخانەی بیری تەنویری و شۆرشگێری و درێژە پێ ـ دەری رێ رەوی ئەحمەدی خانی دەژمێردرێ.

بەلام مێژوی ئەدەبی کوردی لە سەدەی بیستەم دا ناوی زۆر شاعیری بەناو بانگ لە کوردستان تۆمار دەکا وەك : پیرەمێرد ، شێخ نوری شێخ سالح ، ئەحمەد موختار ـ جاف ، بێکەس ، هەژار ، قەدری جان ، عوسمان سەبری ، جگەر خوین و هێمن و گۆران ... هتد ) لە نێو هەموویان ـ دا گۆران بە رێبەری قوتابخانەی تازەی ـ شیعری کوردی دەژمێردرێ .

گۆران لە سەرەتای سەدەی بیستەمدا چاو هەڵدێنێ ، کە دەگاتە تەمەنی ١٠ سالی شەری یەکەمی جیهانی هەڵدەگیرسێ ، لە ١٢ سالیدا شورشی مەزنی ئۆکتوبەر رووده ـ دا ، لە ١٤ سالیدا سوپای ئینگلیزی کوردستانی باشور داگیر دەکا ، لە ١٥ سالیدا شورشی شێخ مەحمودی مەزن دەست پێ دەکاەواته گۆران لە کاتێکدا دێتە دونیاوە کە سیمای گشتی راپەرینی شۆرشگێری و خەبات و تێکوشانە لە پێناو ئازادی و سەربەخۆیی گەلانی چەوساوە .

بێگومان ئەو گۆرانەی لە جیهان و ناوچەکە روو دەدا کار دەکاتە سەر هەموو لایەنی ژیان بە گشتی و بیری کۆمەلایەتی و هونەر و ئەدەب بەتایبەتی، ناوەرۆکی نوێ دێتە کایەوەو ئەو ناوەرۆکەش پێویستی بە فۆرمی تازەیە .

گوران لە ١٢ ـ ١٣ سالی یەوە دەست بە نووسینی شیعر دەکا ، بەلام مێژووی یەکەم پارچە شیعری دەگەرێتەوە سالی ١٩٢١ .

شاعیر سەرەتای شاعیریەتی خۆی بە سالی ١٩٢٥ دادەنێ . گۆران وەك زۆربەی شاعیرانی کورد و رۆژهەلاتی ئەوە راست بە عەرەل دێتە مەیدانی بلاو کردنەوەو لە چوارچێوەی عرووز دەرناچێ . بەلام وەك خۆی دانی پێ دادەنێ شێخ نوری شێخ سالح و رەشید نەجیب بەر لە ئەو لە قاعیدەی شیعری کۆن لا دەدەن ، دیارە شێخ نوری و رەشید نەجیب و گۆران لە رێگای زمانی تورکیەوە ئاشنایی لەگەڵ قوتابخانەی شعری تازەی تورکی " فەجری ئاتی " پەیدا دەکەن ، ئەوەش رێگا نیشان دەر دەبێ بۆ ئەو باخی بوونە . گۆران بە پێچەوانەی شاعیرانی هاودەمی و تێ گەیشتنی بۆ ئەرك و رۆلی ئەدەب و لێ هاتوویی زانینی زمانی فارسی و تورکی و ئینگلیزی و ئاشنایی پەیداکردن لەگەل ئەدەبی جیهانی و رێبازی رۆمانتیزم لە هەوڵدان بەردەوام دەبێ بۆ دارشتنی ناوەرۆکی نوێ لە فورمی تازە. ئەو فۆرمەش لە کێشی خۆماڵی دەدۆزێتەوە. گۆران لە سالانی ٣٠ ـ ٤٠ بە تەواوەتی و یەکجاری مال ئاوایی لە عرووزی عەرەبی و فۆرمی کۆن دەکا،بەمەش شۆرشێکی گەورە لە مێژووی ئەدەبی کورد بە رپا دەکا .

بێگومان رێبازی رومانتیزم چ وەك شێوە ، چ وەك ریباز دەورێکی کاری گەر لە پێشکەوتنی ئەدەبی کوردی دەبینێ .

سەرەتای هەڵوێستی سیاسی گۆران و خۆ بەستنەوە٥ بە بەرەی میللەت دەگەرێتەوە بۆ راپەرینی ٦ ی ئەیلوولی ١٩٣٠ و لە شیعری هەڵبەستێك "دا خۆی دەنوێنێ . لە دوایی سالانی ١٩٣٠ گۆرانێکی گەورە لە بیرو هونەری گۆران روودەدا . هەرچەند ئازار و ئەشکەنجە و چەوسانەوە زۆرتر دەبێ تێروا ـ نین و بۆ چوونی و هەڵسەنگاندنی رووداوە ـ کانی لاروون تر دەبی و ناوەرۆکی کۆمەلایەتی و نیشتمانی شیعرەکانی قوول تر دەبی . هەلگیرسانی شەری دووەمی جیهانی و خەبات دژی فاشیزم و کار کردن لە ئیستگەی رادیوی " شرق الادنی " کار دەکاتە سەر بیرو باوەری گۆران بۆ چوون و هەڵویستی و تێ گەیشتنی ناوەرۆك و شێوەی خەبات ، بروای بەتین تر دەبێ بە دوا رۆژی چینی چەوساوەو سەرکەوتنی خەباتی گەلان.

گۆران وەك مرۆڤێکی هەست ناسك و نیشتمانپەروەرێکی راستەقینە مرۆڤێکی ریالیست و راستگۆ ، گرانی لێ بووردن و فیداکاری کۆمۆنیستەکان لە شەری جیهانی دووەم دژی فاشیزم و کۆنە پەرستی کار دەکاتە سەر هەڵوێست و هەلبژاردنی رێگای خەبات و نزیك بوونەوەی لە کۆمۆنیستەکان . سالی ١٩٥٠ لە لایەن دادەستەی کۆنەپە ـ رستی عیراق زیندانی دەکرێ، ئەشکەنجەو ئازار دەدرێ بە مەبەستی دەم کوت کردنی، بەلام گۆران ـی خاوەن بیرو باوەر و هەڵو ـ ێست ، بە پێچەوانەی بۆچوونی رژێم، دەچێتە ریزی پارتی کومونیستی عیراق و تا دلە گەورەکەی لە رۆژی ١٨/١١/١٩٦٢ لە لێدان دەوەستی ، بێ وچان لە ریزی پارتی کومونیست دا خەبات دەکا .

ئەمسا رووناکبیران و شاعیرو نووسەرانی کورد یادی ٢٥ سالەی کۆچی گوران ـی مەزن یەکەمینە،رۆژی یەکگرتنی ریزەکانمان و خەبات لە پێناو دوا رۆژێکی روناك بۆ گەلی قارەمانی کوردستان . ●

جەمشیدی حەیدەری

دیێ رەشی ناو چوارگوشەی رۆژنامەی رەش پوش وماتەم
چاوی خستە پێشکە وپێشکە ، رووناکایی لێ بوبە تەم

لە خەو دا بوم ، یا خەبەر بوم ، خۆشم نەم دەزانی تەواو
هێشتا دڵ و مێشك وهۆشم ، باوەریان نەدەکرد بەچاو

چۆن ئێستە ماموستا گوران ، میوانی گردی سەیوانە ؟
میوانی کێل وخاك وخۆڵ ، میوانی دار ئەرخەوانە ؟

چۆن ئەو دڵە پڕ ئاواتەی ئێستە لێ نادا وەستاوە ؟
برا گەل کۆچی گۆرانمان ، جەرگ بڕیکی تەواوە

زامی سەختی کۆچی گوران هێشتا گەرماو . گەرمە بۆیە
هەست بە ئێش و ئازاری ناکەی ، نازانی چە نەخۆشیە

ئەی مێژوی ئەدەبی کوردی ، کوانی لاپەرەی ئەرخانت ؟
ئەی خوای هەڵبەست کوانی شعرت ، بۆ یادی کۆچی گورانت

ئەی تاقی ئازادیخوا ، کوا شاعیری روشنبیرت
کوا هەڵبەستی پڕ باوەری بۆ لادانی زنجیرت

کێ ئی تۆ ئێستا ، لاوکی سوور ، لەناو تاریکایی شەوا
بۆ چریکێنێ و پای پەرینی لاوانت لە شیرین خەوا

کێ ئی تۆ زیندانی ئەندەماك بە بانگی گەل دەیەوخێنێ
کێ ئی تۆ بە سروود دەماری شۆرشگێریت دەجوولێنێ

ئەی کۆتری ئاشتی پیکاسۆ ، کوا دەنگ وجاقوی بەسۆزت
کوا سروودی ئاشتی خوازیت ، بۆ هاوری و دۆستی دڵسۆزت

ئەی ڤینۆسی خوای جوانی ، وا عاشقی دیوانەت رۆی
کوا دەست وپەنجەی شمشاڵیت ، بۆ پەیکەری ئاتاشی بۆی

کێ ئی تۆ وەك ئەو چەپك چەپك ، گوڵاڵەی جوانی هەمە رەنگ
ئەداتە دەس ناوای تانە بۆ دەزگیرانی شۆخ وشەنگ

بۆ لاپەری ٨

## بەستەی نەبەز

گۆران

من ئەو دیلەم لە زیندانی تاریکا
هەتاوی بێ ڕووناك ئەکا بەرچاوم ؛
بەناو هەزار حەڵقەی داوی باریکا
قەفی زنجیر ئەپچڕێنێ هەنگاوم !

من ئەو دیلەم لە پشت شووورای پۆڵاوە
ئاسۆی هیوای گەشم هەرگیز ون ناکەم ؛
لە ڕووی ئاسمان بە گڕی سوور نووسراوە
بەندە بەندەی ئاینن نامەی بڕواکەم !

من ئەو دیلەم ئامانجم قیبلەی گشتە ؛
با ساماندار بێ و پڕ دڕك بێ ڕێی ڕاستم ،
مادام هێزی زۆربەی گەلم لە پشتە :
دڕك گوڵەو ترس ئارامە بۆ خواستم !

من ئەو دیلەم کە سزنجی بێ باکم ،
سڵ لە چاوی پڕ لە قینی زەق ناکا ؛
دانە چیڕەی گورگی هاری سەر لاکم
زاتی گیانی ئەلەرزیوم لەق ناکا !

من ئەو دیلەم کە دیلکەری زۆردارم •
دڵی لەبەر گوڕی ناڵەم ئەلەرزێ ؛
تا شرتر کا کەلەی لەشی زامارم ،
خۆی خراپتر لەناو خوێنا ئەگەوزێ !

من سەربازی ئامانجێکم : پیرۆزە ،
فیداکاری ڕێگایەکم : بێ گەردە ،
ڕەنجێك ئەدەم ڕەنجی پیاوی دڵسۆزە ،
لە ڕێیەکا بێباك ئەمرم : ڕێی مەردە ! •••

**سلێمانی ـ ١٩٥٢**

پاشماوەی ل ٧

### بۆ مامۆستای کۆچ کردووم •••

کێ بێ وەکو ئەو زای سەختی سەرسنگە گوڵڵەی بافسی شا
لە پێی گوڵی سوور بۆ قوڕی، خۆشەویست بەدیاری دەبا

سیا چەمانەی هەورامان، ما گۆران ڕۆی کێ ئەت دەبینێ
کێ وەکو ئەو بە ئاوازی خۆش تەلان تەلان بۆت دەخوێنێ ؟

ئەی کوێستانی دیمەن جوان، کوانێ وەستای شعر و هونەر
بەستی ملوانکەت بۆ بریسکا، لە دانەی مرواری وگەوهەر ؟

کێ بێ تر وەکو ئەو دڵسۆزانە، وەستی دیمەنی جوانت بێ
کێ بێ بە هەڵبەستی کوردی وەکو مەلی نەغمەخوانت بێ

کێ بێ وەکو کەوی نزار، بنیری بۆ لووتکەی سەربالت
قاسپەی بۆ بێ هۆنینەوە، دیمەنی جوانی خاڵ خاڵت ؟

کوا دەنگی نەرمی مامۆستا لە کۆڕی ڕۆشن بیرانا
پەپکە گوڵی شعری تازەی کوردی دانێ لە گوڵزارانا ؟

توانامە نیە پێنوس بگرم، بیکا نالکێت پەنجەی دەس
بە حاڵێک جوڵەی لێوەدێ و بۆم دەنووسێ دیڕە مەبەس

ئەی مامۆستای قوتابخانەی شعری تازە و قوتابی نوێ
بنوو پێڵووی چاوت لێک نێ، ئاسوودە بە ڕۆژێک هەردێ

دڵنیابە، لەو ڕۆژەدا، پەنجەی دەستی هونەرمەندان
پەیکەرێکی شایەن بە خۆت بۆ دەتاشن لە کوردستان

دڵنیابە شعرەکانت، و بیری سەردەمی لاوانە
مایەی شانازی ئەبێ کە لی کورد و کوردستانە

٢١ - ١١ - ١٩٦٤

پاشماوەی لاپەرەی ٥

## کورد وکوردستان

پاشان نووسەر پەنجە بۆ ئەوە درێژ دەکا کە لەو بیست و پێنج ساڵی دوایی دا، بزووتنەوەی کوردی لە رووی سیاسی و ڕێکخستن و ئیدیولۆژیەوە پتر پێ گە یشتوە و بەرەو پێش چوە •

نووسەر هەروەها باسی بارو دۆخی عیراق دەکا دوای شۆڕشی تەموزی ١٩٥٨ و دان نانی دەوڵەت بە مافی ئوتونومی کوردستان کە بەرهەمی خەبات و سەرکەوتنی تێکۆشانی چەکدارانە بوە بە سەرۆکایەتی مستەفابارزانی •

لە سوریاش مەسەلەی کورد تاکۆتایی پەنجاکان رۆڵێکی دیاری نە بوو، بەڵام لە ژێر تەئسیری بزووتنەوەی کورد لە عیراقدا خۆی نواند •

لە ئێرانیش دوای رووخانی کۆماری ـ کوردستان و لە ماوەی نیزیکەی ٢٠ ساڵ گەلی کورد لە ژێر ستەمی چەوسانەوەی ڕێژیمی شادا نەیتوانی سەر هەڵبێنێ • بەڵام دوای سەرکەوتنی (شۆڕشی ئیسلامی) رووداوی بە تەوژم لەو ناوچەیەدا سەریان هەڵدا کە سێ بەڵگەمان بۆ دەسەلمێنن :

١ ـ هەرەس هێنانی بزووتنەوەی نەتەوایەتی کوردەکانی ئێران تەواو موتلەق نەبوو، بەڵکوو کاتی بوو •

٢ ـ ئەو ریفۆرمەی بە (شۆڕشی سیی) ناوی دەر کردبوو، دەرێنگ کە پشتە ئەو ناوچەیە و نەیتوانی مەسەلەی نەتەوایەتی چارە سەر بکا •

**کۆتایی ئەم مەبحەسە لە ژمارەی داهاتودا دەی هێنینە بەر چاوی خوێنەرانی بەرێزی سەردەمی نوێ**

پاشماوەی لاپەرەی ٤

## شۆرشی سوسیالیستی ئوکتوبەر

لە ساڵی ١٩٢٢ دا یادداشتێکیان دابو بە سوڤیەت و پەروزیاسیان لێ کردبون دەربارەی هەست و هۆشیان بەرامبەر بە گەل و نەتەوە بەشخوراوەکان •

میجرسونی حاکمی سیاسی سولیمانی کە لە ماوەی دەسەڵاتی شیخ مەحمود و لە کاتی ئاوارە بوونی شیخ مەحمودا بۆ هیندستان لە یەکێك لە نامەکانیا بۆ (ویلسون) ای حاکمی گشتی بریتانیا لە بەغدا بۆی نووسیبو ئەڵێ : بەداخەوە ئەمرۆ هێندی کەس لەم ناوچانەدا فێری ناو و بیرو باوەری (بولشەویك) بوون•

بێ گومان نامەکەی شیخ مەحمودی شۆرشگێری کورد دژی ئیمپریالیزمی بریتانیای داگیرکەر لە ١٩٢٣/١/٢٠ دا لە رێی کونسولخانەی رووس لە (ئازربایجان) ەوە ناردبوی ( ئەڵێن ئەو نامەیە لە یەکێك لە ژمارەکانی رۆژنامەی پراودای ئەوساڵە دا بڵاو کراوەتەوە، بەڵام بەداخەوە زۆرم تەقەلادا دەقی ئەو بڵاو کردنەوەی ناو پراودا م دەس نەکەوت کە لەو باسەی دەربارەی شیخ مەحمود ئامادەم کردوە وەکو خۆی بڵاوی بکەمەوە ) • لەو نامەیەدا شیخ مەحمود رووونی کردۆتەوە کە چۆن شۆرشی ئوکتوبەر بۆتە جێگای هیوا و ئاواتی میللەتانی بەشخوراو و داوای لە شۆرشگیرەکانی ئوکتوبەر کردبوو کە بە هاواری گەلی کوردەوە بچن و دەری بریبوو کە گەلی کورد ئامادەیە مافی چارە نووسی خۆی بیەستێت بە سوڤیەتەوە • بێگومان ئەو نامەیە دەری ئەخات کە شۆرشی ئوکتوبەر تا چ رادەیەك کاری کردبوۆە سەر گەلانی رۆژهەلات •

---

(٢) بۆ ئەوە سوود لە کتێبەکەی دوکتور کمال مظهر ـ اضواء على قضايا دولية في الشرق الاوسط ـ چاپی عەرەبی ـ بغداد ساڵی ١٩٧٨ وەرگیراوە•

بۆ ئاگاداری

ئابوونەی ساڵانە

١٢٠ کرۆنی سویدیە •

P.O.BOX 7066
163 07 SPÅNGA
SWEDEN

Postgiro: 420 4506 - 2

Ji r.1

# Bîranîna "Goran"ê

Dinav wan ji de, navexani geşdare ji ber ku wî mesela netewî û rizgariya kurdan aniye nav edeb, bi wê çende wî tiştek nû di nava edebê kurdî de peyda kir. (Memû Zîn) ji karên mezinên edebî yên rojhilata navin û cihanê têne nasin. Di despêka sedsaliya 19 an de, li ser destê mela xiderê Nalî demek nû di diroka edebiyata Kurdî de dest pê dike. Disa her di wê serdemê de çen şairên din ji navî wa geşe wek: Mewlewî, Kurdî, Salim, Şêx Reza û Hacî Qadirê Koyî.. Di nav wan de Hacî Qadir bi xwediyê medresa bira şorişgerî û hajokê rêya xanî dihête hejmartin. Lê diroka edebiyata Kurdî navê zor şairan tomar dike, mina pîremêr, Şêx Narî, Ehmede Muxtarcaf, Bêkes, Hejar, Qadrî Can, Osman Sebrî, Cigerxin, Hêmin û Goran..Htk. Lê dinava wan hemyan de Goran tête hejmartin rêberê medresa nû ya şiira Kurdî.

Goran di destpêka sedsaliya bistan de hatiye dinê. Wekî şerê cihanî duwem despêkir, ew dehsalî bû. Di jiye wî yê 13 salî de şorişa mezina Oktoberê qewimî. Dema şorişa Şêx Mehmûd, ew 15 salî bû. Kurd û Kirmanc: Goran di serdemekî pir bizav û şoriş û xebat ji bona azadiya gelande peyde bûye, û wan rûdanan kar li ser jiyan û bîr û hizrên wî kirye û bûye egera peydabûna wê nûyatî ya ku Goran payde kirî.

Goran di jiyê 12-13 salî de dest bi nivisina şiirê dike. Lê roja yekemin şiira wî ve di geresala 1921. Lê ew bi xwe -ala 1925-an bi sala destpêka şiirên xwe dadine.

Goran wek gelek şairên Kurd û rojhilata navin, bi "xexel" evidarî dihête meydana nivisandina şiirê û ji çarçava (Iroz) der na keve wek ew bi xwe dibêje: Şêx Norî û Reşid Necib berika wî ji şiira kilasikî derdikevin. Diyar ew hersê biriya zimanê Tirkî niyasinê bi şira nû ya Tirkî reçê diken.

Goran beruvajî şiirên demê xwe û têgehiştina wî bo rol û karî edebî û şiyana wî bi zimanê Farisî, Tirkî û Ingilizî û şarezayî ya wî di edebê cihanê de rêya romanîzm digire naverokên nû di formên teze de û di kêşeke xumalî de peyde dike. Ew di salên 30-40-an de bi temamî dest ji (Iro)a Erebî û rengê kevn berdidet, bi vê çendê ew şorişekê di nava edebiyata Kurdî de peyde diket. Bê goman rêbaza (romantizim) çi bişêweçi ji rebaz rolekmezin di pêşdebirina edebê kurdî de dibine.

Destpêka helwistê Goran û xwe girêdan bi alê gel vejî sala 1930-an de tê ku ew bixwe di şiira "Helo beg"de di nivise. Piştî sala 1930 gurinek mezin di bîr û bawer hunevê wî de peyde dike. Her çend êsan û işkence pirtir dibin navaroka şiirên wî kurtir dibe.

Bûna şerê cihanî yê duwem, xebat li dijî faşizmê û Karkirin di radiuwan "rojholata biçûk" de karkire ser bîr û bawerên Goran. Hizra wî kurtir bû û bawerî ya wî muhumtir bû. Ji bû pêşeruja çîna karker û xebatkar û rizgariya gelan. Goran hest nazik, wilat perwer, rastbêj û riyalist bû. Ji bergiyanê lê bûrin û fidakariyê komonistan di şerê duwemê cihanî de dijî faşizme û kenveperisiye, wî li komomistan nizik diket û rêya xebatê di helbijêrit.

Sala 1950 ji alê desteka kevneperesta Iraqê ve hate zindan kirin û hate işkence dan. Ji bo bêdeng bikin. Lê Goranê xwedî birûbawer û helwist berûvajî hizra rijêmê, ew di çite nav rêzên partiya komonista Iraqê û heta roja 18-11-1962-an dilêwî yê mezin rawesta ew her komonist ma. Dê bila ronakbîrên Kurd bîranîna 25 salên Goran bikne roja yekbûna xebatê ji bo paşerojek geş bo gelê Kurdistan. ●

Dr.Cemşid Heyderî

## BESTEY NEBEZ

Goran

Min ew dîlem le zîndanî tarîka
Hetawî bîr runak eka berçawim ;
Benaw hezar helqey dawî barîka
Qefî zincîr epiçrênî hengawim !

Min ew dîlem le pişt şuray polawe
Asoy hîway geşim hergîz win nakem ;
Le rûy asman begirî sûr nûsrawe
Benide benidey aîyn namey birwakem !

Min ew dîlem amanicim qîbley gişte;
Bo samidar bê u pir dirik bê rêy rastim,
Hodaim hêzî zorbey gelim le pişte :
Dirk gule u tirs arame bo xwastim !

Min ew dîlem ke serincî bê bakim,
Gil le çawî pir le qînî zeq naka;
Dane çîrey qurgî harî ser lakim
Zalî qîyanî neler zîwim leq naka!

Min ew dîlem ke dîl kerî zordarim.
Dilî leber qorî nalem elerzê;
Ta şir tirka kelbey leşî zamarim,
Xoy xiraptir le naw xwêna egewzê !

Min serbazî amancêkim: pîroze,
Fîdakarî rêga yekim: bêqerde,
Rencêk edem rencî piyawî dilsoze,
Le rêyeka bê bak emrim: rêy merde !

" بـــۆ ئــاگـــاداری "

زۆر کەس لە خوێنەرانی بەڕێزی " سەر دەمی نوێ " پتر لـــە
ساڵ و نیوێکە ئابوونەی سا لانەی خۆیان نەناردوە٠ بە ناچاریەم
بۆنەوە رادەگەیێنین ئەو کەسانەی ئابوونەی سا لانەی خۆیان نــە
نێرن ، لەم ژمارەیەوە ئیتر رۆژنامەیان بۆنانێردرێ ٠
دەتوانن ئابوونەی سا لانەی خۆتان بە ژمارە پۆست گــیـــــرۆی
"ســەردەمــی نــوێ " بنێرن و یارمەتی بە درێژە پێدانی دەرچوونی
رۆژنامەی خــۆتان بکــەن ٠
ئابوونەی ســا لانەی سەر دەمی نوێ بۆ وڵاتانی ئەسکەندینا وی
(١٢٠) کرۆن و بۆ ئوروپا (٥٠) مارکی ئەلمانی رۆژ ئاوایە ٠

Ji r.1

# Bîranîna 50 saliya serhildana Dêrsimê

Binbirkirina wê berxwedanê bi kuştina hejmarek mezin ji kurda temam bû ku ew çend bi temamî di kitêba (Dr. M.Nuri Derimi) de ku sala 1952-an li bajarê Heleb bi zimanê tirkî belav bû, xweya kiriye. Di wê kitêbê de, nama serokên berxwedana kurdan belav kiriye, ku roja 20/11/1937-an ji civîna netewên hevgirtî ve şandibû.

Di wê namê de gotiye: Ji bûna nehêlana Kurdan hukmeta Tirk xwe ji çi gunehan na dete paş. Wê dest bi kavil kirina xaniyan û derbiderkirina xelkî deste deste kiriye. Top, firoke û heta gaza xendiqandinê ji li diji kurdan bikar aniye. Ew her deh kesan di ben ciyekî û nahêlin ew li çi ciyan ji 5% ji Tirkan pirtir bin.

Di namê de nivisiye:

"Hukûmeta Tirk bi zorê keç û jinên Kurdan dixit nav malên tirkan ku kurdan bi zori bike Tirk."

Di sala 1937-an de wilayet (Tunceli) danî û deverên Îlyazik û Erzincan ji kistine ser. Li divan 50 salan de çi bi ser hatiye?

Ji hingê were ew dever bi war û ciyê serbazî danaye. Di demê wan 50 salan de, çi guhrinek abûri û civakî biser de nehate. Ji alê seneti (pişesazi) ve, Dersim dereca şest û pêncan ne. Di sala 1965-an di hemû Tunceli de tinê yek nexweşxane hebû ku 75 ci têde bûn. Di salên şêst û heta hefiyan de, dema çepên Tirk serê xwe hildan, hingê Kurd ji li xwe bizivin û dest dane karî siyasî. Yan kurdan partên serbixwe yên netewi, yan ji di yên sosyalistên têkel di çepên tirk de danan.

Li gor nivisandin rojnamenivisê tirk: Piştî Înqilaba 1980-an xwendingehên kurdan daxistin û dayrên (Emniyet) têde danan. Bi tinê yek xwandingehek bilind ji bû fêrkirina mamostayan hebû, ew ji kirine serbazxane.

Li Tunceli tenahî tuneye, piştî seat 11 şev kes nikare der keve û ew kesên piştî wî demî li der bin, wan digirin û ta sibê işkence diden.

Ji sala 1980-an ta niha du walî û General guhrîne. Waliyê niha ku navê wî (K.Guvun) e, ew ne reziye ji ber ku ji 19 hizar kesan re bitenê cwar mizgeft hene, lê kes guhdari giliya wî na ke. Ew dibêje: Li Tunceli ji bili serbazxane, polisxane û cihên emniyet, çi xaniyên nû tune ne, herçend xelkê Tunceli Tirkên paqijin lê li çiyê dijin, (Wek ew di bêje).

Rojnama (Cumhuriyet) dinivise:- Li Tunceli tirumbêlên eskeri û polisî ji yên ehlî pirtirin, Tunceli wek zindanek mezine di welatî de. Di vî bajarî de her keseki sê polis digehnê, yani ku hejmara polisan sê car hindî hejmara xelkê bajariye! Li gor nivisîna rojnama (Huriyet) sala 1986-an hukûmetê destekên çekdar danan, her destekek ji 9 kesan pêk hatiye û 5 ji wan xelkê deverêne.

Li meha sêptêbera 1986-an leşkerê kemalî li devera Erzincan li diji partizanê Kurdan bikar anin, ku hejmara kuştiyên wan ne hate zanin. Li gor hejmera dewletê, sala 1970-an hejmara xelkê Tunceli 157, 293 kes bûn. Sala 1980-an hejmara xelkê Tunceli 157, 874 kes. Hingê hejmara xelkê Tirkiyê 9,131,781 kes zêde kiribû. Zêde kirina xelkê Kurdistanê ji wê demê 23% bû.

Hukûmeta Tirkî bi hemo rêyan dixwaze Kurdan ji nav bibe. Ew reşkuştina beri 50 salan li Dersim bûyi, heta niha her dom dike. Kurdan serê xwe carek din hildaye ve û dê li Dersim ji bipeqe.

(Serdema Nû) digel sipasiyên xwe bo yê ev gotar nivisi, dixwaze pirtir bûyerên Dersimê xweya bike. Dr.Seid Ebdal di kitêba xwe ya liser dersim dibêje:- "Du sala 1925-an de Dersim bû binkek sereki ji bû bizava çekdariya Kurdan li Kurdistana Tirkiyê.

Ji bo ku hukmeta Tirk bi temamî biser Kurdan de bigire, wê di sala 1932-ande yasayek (qanûnek) derxist, li gor wê yasayê temamiya Dersimê bête çolkirin.

Di sala 1936-ande leşkeri çawar rexên Dersimê girtin û fermana leşkeri têde dana. General "Alp Dogan" kirine fermandarê leşkeri û wî bi belav kirina beyanekê, daxwaza 200 hizar tivergan ji xelkî kir.

Xelkê Dêrsimê neçarbûn bi rêberiya "Seyid Riza" li berxwe bidin. Li bihara 1937-an de piştî kuştina Birehim kurê Seyid Riza, şer dijwar bû. Hukûmeta Tirk bi hêrişên hovetî û bi peyda kirina şeri dinavbera Kurdan de şerê Kurdan kir.

Bi kuştina "Eli Şir" ê Şair û siyasî, dirbek mezin bi berxwedana kurdan ket û piştî girtina rêberan, di 18/11/1937-ande Seyid Riza û çend hevalên wî yên din li sêdarê xistin. Di demê mehkemê de, tirkan dixwast Seyid Riza biyanî bikin û destê Soviyet bixin nav pirsê. Seyid Riza dê dadgeha tirkan de goti "Ez ji binemaleh Kurdim ku çi car guhdarî biyanî nekirye û binemala min ev çend sed salin ji bû netewa xwe ya

kotayî em gotare le hejmarî 23 dête bilwkirin

Ji r.2

# Şorişa Oktoberê

Bo nimone hingê dinav cotkarên Misrê de rêkxirawek hate dana ku navê wê (Sovyet) bû. Di Hindê û Çinê de ji wê kar lê kir. (Şêx Xalis) û (Mehemed Sedir) ku ser kêşên şorişa 1920 an bûn, ji jêriya Iraqê li diji Beritanya şoreş kiribûn, ew nefî kiribûn Îranê, wan ji pirozbahî li serketina şorişa Oktoberê kiribû.

(Micerson) ê hakimê Silêmaniyê di demê desthilata Şêx Mehmûd de, wextê Şêx Mehmûd aware bû bo Hindistanê, di nameka xwe de bo (Wilson) ê hakimê giştî yê Beritaniya li Bexdayê bo nivisibû: Mixabin evro hine kes fêrî nav û bir û baweryên Belşevik bûn.

Bêgoma nama Şêx Mehmûdê şorişgerê Kurd ku roja 20/1/1923 an bi rêya balyozxana Rûsî li Azirbêcanê nardibû, (Dibêjin ew name wê salê di hejmareke rojnama Piravde de hatibû bela kirin, Mixabin min nikaribû wê jimara rojnamê peydakim). Şêx Mehûddi nama xwe de diyar kiribû ku çawan şorişa Oktoberê bûye hêviya gelên bindest û daxwaz ji şoreşgerên oktoberê kiribû ku ew li hewara gelê Kurd bên û diyar kiribû ku gelê Kurd amadeye çarenivisa xwe bi Sovyet ve girêbide. Ew name dadixe ka çend şorişa oktobir karkiribû ser gelên azadixwaz. ●

Hawar

XWEDI:
Dr. Cemşîd Hayderî
BERPIRSYAR& REDAKTOR:
Kerîm Hussamî
TRYCK: ARARAT TRYCK

# Serdema Nû

*Rojnameke siyasî, çandî û civakî ye*

P.O.BOX 7066
163 07 SPÅNGA
SWEDEN
Postgiro: 420 4506 - 2
ISSN 0284-3412

Sal 2 Hejmar 22 çiriya pêşî -November 1987 Biha:10 skr.

## Şorişa Oktoberê

Beri 70 salan mezintirin kela kevneperest û sermayedar bi das, çekuç û bêrên karkeran hate herifandin ku diwarên wê bi hestî û kuloxan û heriya diwaran bi xwina rût û bi çiyan hatibû şêlandin. Ew bi hişyariya ronakbirên şoreşgerên wê demê yên Rûsi bi rêberiya Lenin hate şewitandin, ku bi wê çendê xelekek mezin ji sermayedariya cihanê hate şikandin û berê bin pê hemî kapitalistên cihanê lerzî ji tirsên gehiştina şorişa Rûsi.

Şorişa Oktober û ew serketina şoreşgeri, bi danana bere binyati yê yekem dewleta gel û ji bin kirina rihiyên derebegatî û koletiye û pişik kirina erdê bi ser cutkaran de, ew hemî mistek giran bû li bûye emperyalizmê xist û bû hemoyan xweya bû ku dibe birû bawerên Markisî ji nivisênên ser kaxezan bibte karû dayar kir ku ew ne tiştek xeyali ye. Lê ew berhemê birkirin û lêk danek zanistiye û vejandina qûnaxek nû ye di guhrina dirokê de û pêş ditinek şarezaye ji bû hajotina karwanê xebata çinayetî û ji bû navbirîna hemi rengên koletî kirina mirovi ji alê mirovek din ve karê abûri di jiyana civakî ya miletan de hemi bi pêvana şareşayên wek Markis, Engils û Lenin û bi tiraziyek rast û bê fêl û xwari hatiye kêşan. Ev demê 70 salane emperyalist bi hemi hebûnên xwe ve dixwazê qimeta wê şorişê û wan bir û bawerân ji serê xelkî kêm biket û ji bûna wê ji hemî rê dane ber xwe. Ji wan ji li destpêkê wesa hewil da ku bêxin nav mejiyê xelkê ku birûbawerên Markisî metirsiye û eger sosyalist belav bû dê bibe asteng di rêya pêşde çûna saristanetiyê de û ew bi kên xwezi û daxwaziyên jiyana mirovan na yên û her hosa bi sedan dire bi bi dûvê teşya xwe ve nan û her carê bi awazeki benda xwe di got. Car digot ew li diji birûbawerên oletiye û carna ji digot Bolşewik têkeliyên binemali dinavbera kesûkaran de nahêle û dewlet zarokan hildigire her dema ji day dibin û heta mezin dibin û hingê ji kes nas nake.

R.2

## Bîranîna "Goran"ê Mezin her zêndî be.

Beri 25 salan stêra jina Goranê mezin vemiri û wî malavayî ji gelê Kurd kir. Lê herwek ew di jinê de digel me bû, wisa piştî 25 salan ji dema behsa şiir, edeb, helwista mirovati, xwe ragiri li bin işkence û zindana, serşor nekirin li ber dijmin, û birûbawerên negor, navê wî li pêşiyê ye. Hin gengeşe û vekolin li ser rolê Goran di pêşdebirina edebû şiira Kurdi û dewlemend kirina ziman û ferhenga Kurdi de, rêberiya medreseya nû ya şiira Kurdî de berdewamî.

Herçend li ser wi bête nivisandin, herkême, çunki ew gupitka bilindahiya şiira kurdi ye gerek bi dehan vekolin li ser berhemên wî bêne kirin. Ziman û ferhanga şiirên wi, ew wek rexnegir, wergêr, rojnamenivis, tekoşerê siyasî û Htd. Li hember Goranê mirov û şair de kêmasi hatiye kirin, belki hine caran ji ne garan viyaye bi qest navi wi bişkênin. Di xwestin rola wi di diroka edebê Kurdi yê evro de, yan Goranê hunermend, be bevil û ser kêşê şiira nû ya Kurdî ji Goranê têkoşer û Komonist cuda biken, bi hêceta hindê ku wi rêyek siyasi daye berxwe lew ma tamek xweş ji şiirên wi nayêt yan hunerê wan ne rinde!! wan dê di bêjin lêbêyi ku bizanibin taybetiyên şiira siyasi cuda ne yek ya du, têkel kirina bira niştimanî û netewi digel bira markisîzm, naveroka komelati (Civakî) di şiirên Gorani de bilintir kur û tagiriya çina bendest di berhemê wî de bihêztir kir

Diroka edebê kurd ji kevin de navên zor şairên mezin bi pitên zêrin di rûperên xwe de nivisandine, ku her yek ji wan di dema xwe de işkên mukum li danana diroka edebi kurdi de dane û derbirê bira civaki çendiya hunerê serdema xwe bû.

Di sedsaliya (14-18) an de, di nav bi sedan şair navê çan şiiran di pêşxistina edebi kurdi de her dê dubare bibe. Mina Feqê Teyran, Heriri, Ciziri, Xani û Xanê Qubad û.. htd.

R.4



## Bîranîna 50 saliya serhildana Dêrsimê

**Radi**

Kurdistan ne warê agirpeqijinêye, lê çareser nekirna pirsa Kurdi ji alê civaki, netewi ew kiriye warê agirpeqijinek siyasi ji her ali. Êk ji wan warên agirin, Dêrsimê. Sala 1936-an hukmeta Tirk navê wê kiribû (Tunceli), sala 1937-an serkaniya Agir lê peqi. Li wir serhildana Kurdan rabû û du salan dom kir. wî demi serûberê Kurdan li wir pir alozi bû. Ew ji hemo deverên din paşde tir mayiye.

Li şûna nexweşxana, xwindingehan û avedan kirinê, hukûmata Tirk li wir serbazgehan ava dike. Ku her ew bû egera serhildana Kurdan. Hukûmeta Tirk ew dever bi ciyê şoriş û serhildanê navkir. Sala 1937-38 serbaz û leşkerê Tirkan serhildana Kurdan bi top, firok û bomban ew serhildan ji nav bir. Sala 1937 li meydana (Îlyazik) 11 kes ji serkêşên kurdan li sêdarê xistin.

R.3